Nûçeyên Hackney Homes
Mijdar 2007

Nîştecîh tevlêbûnê pêşde dibin

Dibe ku we li sîteyan poster, afîşên dîregan û li Ofîsên Taxan nîştecîh dîtibin ku qal dikin ku nêrînên xwe çawa dibêjin. Sipas ji bo hemû nîştecîhên ku tev lê bûn û tecrubeyên xwe yên li ser tevlêbûnê parvekirin.

Kelly ji Homerton, pir bi hewes bû ku nêrînên xwe yên li ser çêtirkirinên pêwîst ên li hin qadên xizmetê yên taybetî pêşkêş bike, tevlêbûna wî ji ber vê yekê bû. “Ez kirîyarekî ne eyan ê nîştecîh im û ez xizmetên ku tên pêşkêşkirin test dikim, da ku bicîh bikim ku ew li gora standardê ne.” Kelly, Homerton, E5

Gotina xwe bikin – bi awayê ku hun dixwazin

Hun bi hewes in ku dema ku xizmetên xanî ne li gora pêwîstîyên we bin, dengê xwe rakin? Hun dixwazin tev li biryara awayê xerckirina kirêya xwe bibin?

Çima tev li tîma Nêrînên Xanî ya Hackney nebin ku raman û pêşniyarên xwe bidin bihîstin. Heke hun salê du caran nêrînên xwe pêşkêş bikin, hun ê tev li pişkeke xelatê ya £100 fîşên dîyarîyan bibin.

Tîma Nêrînên li ser Xanî ji kirêdar û xwedî-lease’ên ji seranserî navçeyê pêk tê. Hun dikanin nêrînên xwe bi postê, email, mesaja tekstê an bi tevlêbûna rojên me yên kêfê pêşkêş bikin – bi rastî hema ku hun çawa bixwazin wanî.

Tevlêbûn hêsan e. Hun dikanin:

- Biçin www.hackneyhomes.org.uk , formekê daxin û tije bikin û ji navnîşana posta bêpere ya dayî re bişînin;
- Telefonî me bikin 020 8356 7845 û agahîyên xwe bidin;
- Nav û navnîşana xwe bişînin bo housingconsultation@hackneyhomes.org.uk

Ji me re bibêjin ku hun dixwazin nêrînên xwe li ser çi bibêjin û ji me re bibêjin ku hun dixwazin çawa têv lê bibin.

Piştî ku hun tev lê bûn, em ê bi we re têkilî dahînin ku we vexwînin bo tevlêbûna çalakîyên ku we eleqa xwe dîyar kiriye (ji kerema xwe not bikin ku hun ne mecbûr in ku hercar tev lê bibin). Alîkarîya mesrefên rêwîtî û zaroknêrîyê li cîhê minasib tê pêşkêşkirin.

NÛÇE BI KURTÎ

Înîyên Qurdêla Spî

Hackney vê Mijdarê dest bi Înîyên Qurdêla Spî kiriye – wek parçeyekî bangên seranserî mehekê bo zêdekirina hişyarîya tundûyûjîya li dijî jin û zarokan û rawestandina wê. Çalakîyên BÊPERE her Înî bi dezgehên agahîyê,

semînaran, dahnên Pirs û Bersîvan, huner û fîlmên bi xwe kişandî, axaftvanên mêvan û xwarin û vexwarinên sivik ên bêpere.

Her kesê ku li navçeyê rûdine, dixebite, têkilîyên sosyal çêdike an dixwîne tên vexwendin ku werin. Bûyer li vir tên lidarxistin: Queensbridge Sports and Community Centre, 30 Holly St, E8 3XW 11.00 – 18.00. Ji bo qeydkirinê têkilî bi Kathy re li 020 8356 4464.

Dema ku hun dikevin bloka xwe hun derî li dû xwe digirin?

Hackney Homes û Polîsê Navçeya Hackney tînin bîra hemû nişteçîhan ku her tim di dema ketin û derketina blokê de derîyên hevpar baş bên girtin.

Wê gavê mirovên ku ji bo dizîyê malan ji xwe re dikin armanc ê nikanibin têkevin hundir.

Karl Winterê Înspektorê Unîta Hevpar a Polîsê Hackney wisa digot,
“Dizên malan derîyên vekirî hiştî baş dibînin û piştî ku têkevin nav blokê dikanin hewl bidin ku gelek daîran tazî bikin. Heke kesek pê li zengilê we bike û ku hun nizanibin ew kî ye, wî/wê nesitînin hundir.”

Hemû karmend û lixwegirên Hackney Homes kartên nasnamê bi xwe vedikin û heke hun şik bikin, divê hun di cîh de telefonî polîs bikin.

Rojek ji bo Rojnivîskê

Hackney Homes ê roja Çarşema 20ê Sibatê Rojeke bê randevû hatinê saz bike.
Di 2006an de me ji bo nişteçîhên kal û pîr rojeke vekirî li dar xist û agahîyên ku we dan me dîyar dikin ku hun dixwazin çalakîyeke din a bi wî rengî pêk were. Îcar em hemû nişteçîhên xwe vedixwînin û em ê bi berfirehî agahî û xizmetan pêşkêş bikin.

Em ê bêtir agahîyê di hejmara Çileyê Pêşîn a Nûçeyên Hackney Homes de bidin. Ji bo bêtir agahîyê biçin www.hackneyhomes.org.uk

Serketina Pûana Peymanê

Hackney Homes bi serketinî Pûana Peymanê ya piştî teftîşeke di dawîya Îlonê de sitend. Ew ji derve naskirina kalîteya xizmetên me yên mişterî ye û di nav de beşên Tamîr, Navenda Têkilîyan, Ofîsên Taxan û Xizmetên Xwedî-lease’an û Mafê Kirînê hebû.

Xelatên Nişteçîhên Aktîv bi lez nêzîk dibe

Dema Xelatên Nişteciîhên Aktîv ên Hackney Homes nêzîk dibe. Namzed zêde dibin û Hackney Homes paneleke hakiman pêk anîye ku kurtelîsta namzedan û dawîyê serketîyên her sê kategorîyan dîyar bike.

Hakimên Xelatan kî ne?
Panela hakiman ji van pêk tê:
• Susmita Noonan, Serok Birêvebir (Demî)
• Rupert Tyson, Serok, Desteya Rêvebir a Hackney Homes
• Rhonda Dewsnap, nişteciîh û xelatgirê 2006an
• Du nişteciîhên ciwan

Serketî yê di 13ê Çileyê Pêşîn de di seremonîya xelatan de bên daxuyanîkirin. Hun ê di Hejmarên Çileyê Paşîn/Sibatê yên Nûçeyên Hackney Homes de bibînin ku kî dibe Nişteciîhê Salê, Nişteciîhê Salê yê Ciwan û Koma Nişteciîhên Salê.

60 Sanîye
li gel Danny Sutcliffe, Endamê Desteya Birêvebir a Hackney Homes

Nûçenameya Hackney Homes vê nêzîkê xwe gîhand Danny Sutcliffe û karê wî yê nuh pê re gotûbêj kir.

Danny, bi xêr hatî bo Hackney Homes. Tu dikanî ji me re çenekî qala xwe bikî?

Ez ji piştgeheke karên xanî têm, ji 1988an û vir de, dema ku min li Korporasyona Xanî wek 'demî' dest bi pîşeyê xwe kir, li vê endustrîyê dixebitim. Pênc salên çûyî, ez li şêwirdarîya xanî û regenerasyonê li Shoreditch xebitîme.

Tu hêvî dikî ku çi bînî Desteya Birêvebir?

Di rola xwe ya wek nûnerekî serbixwe de, ez ê jîrektî û zanîna xwe bînim, ku ji tecrubeya min a xebata bo komelên xanî yên sektora xisûsî û ALMOyên din ên wek Hounslow Homes bidest ketine.

Ji bo şeş mehên bê, hun ji nuha de çi dijwarîyan dibînin?

Ji ber ku di nîvê 2008an de dîsa teftîş çêdibe, dê gelek kar bê kirin ku Hackney Homes têkeve rewşeke baş ku ji Komîsyona Kontrola Hesaban rêjeyeke 2-stêrk bisitîne. 225 milyon sedem hene ku çima ev ê di şeş mehên bê de ji bo Hackney Homes bibe meydanxwazîya herî mezin.

Weha xuya dike ku hun jîyaneke têrmijûl a profesyonel dijîn. Di demên xwe yên vala de hun hez dikin ku çi bikin?

Ez hez dikim ku bi malbtê û hevalan re demê derbas bikim. Ez her weha bi tenîs û fûtbolê dilîzim.

Li Bexçeyê Civakê enerjîya xwe nuh dikin

ji alîyê nişstecîh Arlette Mereau, sîteyên Warburton û Darcy

Şemîya 29ê Îlonê nişstecîhên sîteyên Warburton û Darcy anîn ba hev ku veguherîneke balkêş li bexçeyê me yê civakî yê London- in -Bloom bibînin.

Barbekyûyeke hêja, keleyeke pengizok, bareke ava fêkî ya teze û Konekî Tendurustîyê ku awayên cîhêreng ên masajê pêşkêş dikir, gişt di nav çalakîyên Roja Kêfê de bûn, ku ji alîyê Komela Kirêdar û Nişstecîhan ve bi alîkarîya Koordînatorê Ciwanan ê Hackney Homes hatibû sazkirin û bi Fona Projeyên Taybetî yên Hackney Homes mimkun bûbû.

Nişstecîh û zarokan ji çalakîya bexçe hez kirin, li ber roja payîzê rûniştin, ji alîyekî ve xwarin û vexwarina bijûn tahm dikirin, masajên relakskirinê dibûn, ji alîyekî ve jî galegal dikirin.

"Roja Kêfê serketineke rastî bû. Bi saya her kesê ku tev lê bû û alîkarîya sazkirinê kir," wisa digot Dolores Kellehera nişstecîh û endama Komela Kirêdar û Nişstecîh.

"Roja kêfê hêja bû. Zarokan bi rastî kêf kirin û em hêvî dikin ku gelek çalakîyên wanî bibînin ku civaka me bigihînin hev," wisa digot Seeta Samuela nişstecîh û endama Komela Kirêdar û Nişstecîh.

Nişstecîhên Hawksley Court roja derve bi kêf derbas kirin

Komela Kirêdar û Nişstecîh a Hawksley Court meha çûyî ji bo nişstecîhan mazûvanîya rojeke gera derve ya kêfê kir, derfetek da civaka herêmê ku hinek cîranên xwe bibînin û kêfa tava dawî ya roja payîzê bikin. Her bijî Komela Kirêdar û Nişstecîh ji bo karê hêja.

Heke Komela we ya Kirêdar û Nişstecîh bixwaze rojeke kêfê an jî projeyeke din ku mirovan bigihîne ba hev û bikêrî civakê were, saz bike, li gel Faisal Pirbhai têkilî çêbikin li 020 8356 2126.

Nêrînên xwe bidin bihîstin

Wek parçeyekî guhertinên li awayê tevlêbûna nişstecîh, Peymana Tevlêbûna Kirêdar nuha dîsa tê pêşçavkirin. Peymana Tevlêbûna Kirêdar ew peyman e ku îzeh dike ku nişstecîh, Hackney Homes û şaredarîya Hackney çawa bi hev re xebatê dikin ku bicîh bikin ku nişstecîh tev li biryarên ku bandorê li mal û civakên wan dikin bibin û ku nişstecîh dikanin çawa tev lê bibin.

Heke hun dixwazin li ser reşnivîsa pêşî ku mijarên ku ji xwe ji alîyê nişstecîhan ve hatine rojevê dihundirînin, şîroveyan bikin, li gel Faisal Pirbhai têkilî çêbikin li 020 8356 2126.

Li ser înternetê agahîya nûjen bisitînin

Heke hun eleqedar in ku li ser her tiştê Hackney Homes agahîya nûjen bisitînin, xwe qeyd bikin ku Bultena Duheftane ya Serok Birêvebir bisitînin.

Emailekê ji vir re bişînin ku îro eleqeya xwe dîyar bikin: HousingEditor@HackneyHomes.org.uk

Civînên bê yên Komela Kirêdar û Nişteçîh

Her kes vexwendî ye. Heke hun berê qet tev li civîneke Komela Kirêdar û Nişteçîh (TRA) nebûbin, nuha demeke baş a ceribandinê ye.

- Duşem 3 Çileyê Pêşîn: Whiston & Goldsmith TRA, Community Hall Goldsmith Centre E2
- Duşem 3 Çileyê Pêşîn: Fellows Court TRA, Fellows Ct Community Centre, Kent St E2
- Duşem 3 Çileyê Pêşîn: Rhodes TRA, Rhodes Estate Community Hall, Queensbridge Rd E8
- Duşem 3 Çileyê Pêşîn: Blackstone TRA, St Michaels Church Hall E8
- Çarşem 5 Çileyê Pêşîn: Lockner & Kingsgate TRA, Community Flat 75 Hebden Ct E2
- Çarşem 5 Çileyê Pêşîn: Follingham TRA, Arden Community Hall N1
- Çarşem 5 Çileyê Pêşîn: Gooch House TRA, Gooch House Meeting Room Kenninghall Rd E5
- Şemî 8 Çileyê Pêşîn: Morland and Blanchard TRA, Morland Community Hall Richmond Rd E8
- Duşem 10 Çileyê Pêşîn: St JohnTRA, St John's Community Hall, New North Rd N1
- Sêşem 11 Çileyê Pêşîn: Aspland and Marcon TRA, Marcon Community Hall, Amhurst Rd E8
- Sêşem 11 Çileyê Pêşîn: Geffrye & Harman TRA, Geffrye Community Hall E2
- Sêşem 11 Çileyê Pêşîn: York Row TRA, York Row Meeting Room, E2
- Çarşem 12 Çileyê Pêşîn: Haggerston TRA, Haggeston Community Hall 179 Haggerston Rd E8

- Çarşem 12 Çileyê Pêşîn: Holmleigh Rd & Sandford TRA, Community Hall Oxted Ct Holmleigh Rd Est N16

- Çarşem 12 Çileyê Pêşîn: Milton Gardens TRA, Milton Gardens Community Hall N16

- Çarşem 12 Çileyê Pêşîn: Welshpool TRA, Welshpool House Community Room E8

- Sêşem 13 Çileyê Pêşîn: Herbert Butler TRA, Herbert Butler Community Hall, Mabley St E9

- Sêşem 13 Çileyê Pêşîn: Provost TRA, Provost Community Hall Murray Grove N1

- Sêşem 13 Çileyê Pêşîn: Radley Square & Southwold TRA, Community Flat 45, Southwold Rd E5

- Duşem 17 Çileyê Pêşîn: Wilton TRA, Estate Community Hall, E8

Ji bo bêtir agahîya li ser tevlêbûnê, ji kerema xwe telefon bikin: 020 8356 7845.

NÛÇEYÊN KIRÊ

Li ser înternetê dayin

Li ser înternetê dayina kirê û bihayên xizmetê tucarî ewqas hêsan nebûbû.

Ji Nîsanê û vir ve li dor 1500 dayinên kirê li ser înternetê bi rêya websîteya Hackney Homes hatin kirin û bêtir ji 2000 dayinên kirê bi rêya xeta me ya dayina bi telefonê ya otomat hatin dayin.

Êdî pêwîstî tuneye ku hun rojeke sar a zivistanê ji malê derkevin. Hun dikanin hema têkevin înternetê û van dayinan bikin. Heke hun nikanibin biçin ser înternetê, hun dikanin Dîrekt Debît (yekser ji hesabê we yê bankê) bikar bînin. An jî hema telefonî xeta me ya otomat ji bo dayinê ya 24 seetan bikin: **020 8356 5050**.

Nekevin dahfika deynê karta kredîyê

Em israr dikin ku kirêdar kartên kredîyê bi baqilî bikar bînin ku kirê û fatoreyên din bidin. Karta xwe ya kredîyê wek cîhgira perê neqît bikar bînin, ne wek deynekî faîza zêde.

Heke di dayina kirêya we de dijwarîyên we hebin, dibe ku mafê we yê dozkirina Alîkarîya Kirêya Xanî hebe (li rûpelê paşîyê li agahîyên têkilîyê binêrin). Wek alternatîv, berî ku hun li dû dayinan bimînin, bi birêvebirê xanîyê xwe re têkilî çêbikin.

Bermîlên civakê yên li sîteyên Hackney Homes diguherin

Nuhkirina yên mezin li sîteyên Hackney Homes nuha qedîyaye.

Li seranserî navçeyê bêtirî 3000 bermîlên civakê hene. Bermîlên berê yên girover ku wek ‘paladin’ tên naskirin, cîh dane bermîlên nuh ên çargoşe yên ‘chamberlains’ û ‘euro bins,’ ku mezintir in û gerandina wan hêsantir e, frênên wan xurttir in.

Dave Morganê ji Tîma Paqijkirina Navendî li Xizmetên Hawirdora Sîteyê di bernameya nuhkirina bermîlan de roleke mezin list, hem di radestkirina bermîlên nuh, avêtina bermîlên kevn û hem jî di cîhê pêwîst de tamîrkirina tekerên şikestî de.

Nuha ku ev bername qedîyaye, Xizmetên Hawirdora Sîteyê dê bernameyeke salê du caran şuştina bermîlan saz bike û tamîr û lênêrîna bermîlan bidomîne.

Heke haya we ji bermîlên civakî yên ku divê bên guherandin an tamîrkirin hebe, ji kerema xwe têkilî çêbikin li gel Michelle Bloom li **020 8356 1722.**

Hackney Homes pêşengîya pratîka herî baş a desenfeksîyona avê dike

Desenfektaneke nuh a ne jahrî dike ku stoka ava li milkên Hackney Homes di yek bi yek tankên avê de paqij, ewle û bê mîkrob bimîne. Hackney Homes vê nêzîkê dest bi bikaranîna desenfektana avê ya bi navê SafeSol3 kir, ev berhemeke vedîtî ya KY ye ku li gora ku hemû bakterîyên ku nexweşîyan çêdikin bikujin, hatiye dîzaynkirin.

Berî bikaranîna SafeSol3, awayê herî belav ê desenfektekirina stoka avê herikandina madeyên zêde jahrî di sîstemê re bû, ku dûre divya berî ku mirov bikanibin sîstemê dîsa bikar bînin bi ava paqij jê bihata derxistin.

Dennis Emmettê ji Hackney Homes madeya nuh wek alternatîveke madeyên din ên kîmyewî yên xurt ku bi awayekî belav ji bo desenfektekirina stokên avê tên bikaranîn, ya bêtir bi bandor, ji hawirdorê re baş tarîf kir.

“Her weha hêsan û ji bo kesê ku wê li tankên avê dike ewle ye,” Dennis wisa digot.

Nûçeyên Xwedî-Lease û Xwedî-Milkan

TARÎXA KONFERANSÊ: Şemî, 26 Çileyê Paşîn 2008

Wek ku di *Nûçenameya Hackney Homes*, ya meha çûyî de hat gotin, Konferansa Xwedî-lease û Xwedî-milkan ku ji bo 3ê Mijdarê hatibû plankirin, ji mecbûrî bo sala bê hat taloqkirin (ji ber sedemên ku me nedikanî kontrol bikirna). Dîsa lêborîn ji bo acizîyên ku dibe ku vê yekê ji we re çêkiribin.

Konferans ê îcar di Şemî 26 Çileyê Paşîn 2008an de bê lêdirxistin. Em hêvî dikin ku kesên ku hatina xwe ji berê de belêkirine, bikanibin di tarîxa nuh de jî werinê. Konferansê li Ocean, 270 Mare Street, E8 (li hemberî Hackney Town Hall) 10.00 – 16.00 bê lidarxistin.

Em ji Tebaxê û vir de kesên eleqedar qeyd dikin û lewra muhtemelen hun ê di nav lîsta veqetandî de bên bicîhkirin. **Heke hun hîn jî bixwazin tev lê bibin, dê pêwîst be ku hun berî 30 Mijdar 2007an bi me re têkilî çêbikin û belê bikin, an bi email LHFHconference@hackneyhomes.org.uk an jî be telefonê 0208 356 2288.**

Raporên Hesabê Bihayê Xizmetê

Hemû Xwedî-lease û Xwedî-milkên ku bihayên xizmetê didin ê di demeke kin de **Raporên xwe yên Hesabê Bihayê Xizmetê** bisitînin. Ev rapor ê muamelên ji Nîsana 2006an û heta roja raporê xuya bikin. Seranserî vê mehê, Tîma Pere Komkirinê dê her weha nameyên bibîranînê jî bişîne, lewra ji kerema xwe dayinên xwe di demê de bikin. Heke di dayinê de dijwarîyên we hebin, ji kerema xwe bi Tîma Pere Komkirinê re têkilî çêbikin li 020 8356 2299.

Fonên Amortîsman/Rezervê

Em lêkolînekê pêk tînin ku nêrînên we bisitînin ku divê Hackney Homes li ser navê we **Fonên Amortîsman/Rezervê** birêve bibe. an na. Hun ê pirsnameyekê bisitînin, tê de hinek agahîya li ser fonên amortîsmanê heye û dê bi raporên we yên bihayê xizmetê re werin. Encama vê lêkolînê dê tespît bike ku pêwîstî bi foneke amortîsmanê heye an na û panelek ê bê sazkirin ku polîtîka û prosedura minasib pêk bîne, da ku ji bo vê yekê îmkanan pêşkêş bike û li gora wê fonan birêve bibe.

Komên Fokusê yên Xwedî-Lease

Encamên Lêkolîna Xwedî-lease'an îsal hinek qadên xizmeta Hackney Homes dîyar kirin ku divê bên çêtirkirin. Wek bersîvkirina vê şûnve agahîyê, tîma Xwedî-lease û Mafê Kirînê ji bo nişteçîhan komên fokusê saz dike ku li ser qadên xizmetê yên taybetî û ku bi dîtina wan divê çawa bên çêtirkirin, nêrînên xwe bînin zimên.

Komên fokusê dê ji alîyê hêsankirekî serbixwe ve bên birêvebirin, da ku nehênîbûnê bicîh bikin û dê di 22 û 29ê Mijdarê û 10 û 17ê Çileyê Pêşîn de li Christopher Addison House, Wilton Way (li paş Hackney Town Hall) bên lidarxistin. Her rojekê dê du dahn hebin, dahnekî piştî nîvroj di 14.00-16.00an de û dahnekî êvarî di 18.00-20.00an de.

Em hîn jî li dilxwazan digerin ku tev li van komên fokusê bibin. Heke hun dixwazin tev lê bibin, ji kerema xwe telefonî 020 8356 2288 bikin an jî email bişînin bo HFHnews@hackneyhomes.org.uk. Her dahnek bo 10-12 mirovan sînorkirî ye. Em ê £20 fîşên Marks and Spencers bidin her xwedî-lease'ekî ku tev li komeke fokusê bibe.

Di nav Nûçenameya *Hackney Homes de*…

Hemû kirêdaran dê belavokên li ser guherînên di xizmeta tamîran de di vê hejmara Nûçeyên Hackney Homes de sitendibe.

Guhertin di destpêka Cotmehê de hatin bicîhkirin û kirêdar (xwedî-lease û xwedî-milk ne di nav de) nuha dikanin ji bêtir xizmetên tamîrê ku Hackney Homes pêşkêş dike, sûdê wergirin.

Ji bo bêtir agahîyê li belavokan binêrin an jî telefon bikin bo Navenda Têkilîya Tamîran li 020 8356 3691.